



Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)



wergera ji erebî: Mustefa Reşîd

Tîrêjên Çarşembê

Xelek - 14

Xwedawend û Kesayetiyan Çîroka Tofana Somerî

Bûyerên çîroka *Tofana Somerî* bi hin xwedawend û kesayetiyan va hatiye girêdan û her yekî ji wan rola xwe ya taybet heye. Daku çîroka *Tofana Somerî* avêne û zelal bibe, ka em bi kurtahî navdartirîn xwedawend û kesayetiyan ku têda beşdar bûne bînin ber çavan.

1- Xwedawend An: Ji vî xwedawendî ra "*Anû*" jî tê gotin; ew bavê hemû xwedawendên somerî ye, warê wî li esman bû, ew wek xwedayê esman tê hejmartin. Perestgeha wî li bajarê "*Ûrûk*" bû. Navê wî peyva kurdî "*ê nû*" (yanê yê ku herdem nû dibe û zindî dimîne) tîne bîra me. Ev navê xwedawend "*An*", bû wek navê Xweda di pêşiya navên hin xwedawendên din da jî, wek "*Anlîl*" û "*Ankî*"¹.

2- Xwedawend Cî: Dayîka xwedawendan û kebanîya xwedayê bav "*Anû*"; ew jî zemîne (erde). Navê wê peyva kurdî "*cî*" (cih) tîne bîra me. Ev xwedawend bi xwedawend "*Anû*" ra bû yek (yanî pêra zewicî) û ew bi navê "*Nîntû*" jî hate naskirin. Ev nav maneya "*dayîkbûnê*" dide².

3- Xwedawend Enlîl: Ew wek "*Ellil*" jî tê gotin. Ew kurê "*Anû*" û "*Cî*" ye, û xwedawendê neteweyî ye ji bo Somerîyan û girîngtirîn xwedawendê *Civata Xwedayên Somerî* ye. Ev dişibihe xwedawend "*Zeus*", mezinê xwedawendên *Civata Pansiyona Xwedawendî* ya yûnanî û "*Jupîter*", mezinê *Civata Xwedawendî Romanî*. Ev xwedawend wek xwedayê "*ba* û bahoze" dihate dîtin, û bi navê "*Çiyayê Bilind*" (Kur-Gal) jî dihate naskirin. Ji perestgeha wî (cihê rûniştina wî) ra "*E-Kur*" yanê "*Mala Çiya*" dihate gotin.

Somerîyan ji çiyayên Kurdistanê ra "*Kur-ra*" digotin; yanê welatê bilind (welatê çiyayî), û mirov ji wan çiyayên dîl digirtin û dikirin kole. Ji wan ra "*Lu-Kur-ra*" digotin; yanê "xelkê çiya". Heya niha jî peyva "*lu / lo*" di zimanê kurdî da maye, dema em gazî xortekî yan mêrekî dikin. Peyva "*kur*" jî di ziman da maye. Bala xwe bidin peyva "*bakur*" û peyva "*bayê kur*" yan jî "*kurba*" bi maneya ew bayê ku ji bakur da tê. Ji ber ku bayê ku ji bakurê Kurdistanê da tê bayekî pir sare.

Dibêjin ku pêşî erd û esman bi hev va bûne, û xwedawend "*Enlîl*" esman (*Anû*) û zemîn (*Cî*) ji hevdu cuda kirine, û di pey ra mirov, jîndar (heywan) û şîndar (nebat) afirandine; wî bala xwe dayê çandiniyê, şaristanî avakiriye, gerdûn bi rêz û rêzik kiriye û deshilat û sama xwedawend "*Anû*" birîye. Ev asta wî ya payebilind wisa ma heya ku xwedawendê neteweyî babilî "*Merdox*" ev ast stand, dema ku Babilyan welatê Somer dagîr kir³.

4- Xwedawend Enkî: Jêra "*Angî/Ancî*" jî tê gotin. Ev nav ji du peyvên hevedudanî ye; ji peyva "*An*" (esman) û "*Cî*" (zemîn, erd) pêkhatiyê. Ev xwedawend bi girîngiya xwe di *Civata Xwedayên Somerî* da, di radeya sêhem da, piştî "*Anû*" û "*Enlîl*" tê. Ev xwedawend wek serwerê aqilmendî û zanînê û herwisa xwedayê "*Cîhana Jêrîn*" (*Jiyana Paşê*) tê dîtin. Ew berpirsiyarê avên kûre ku bi somerî jêra "*Abzû*" dihate gotin. Bala xwe bidin peyvên kurdî "*avzê / abzê*"; yanê ava kaniyan ku ji erdê hildavêje. Ev xwedawend kar û barê zemînê bi rêz û rêzik dike; helbet li gor pilana ku xwedawend "*Enlîl*" datîne. Û vî xwedawendî mirov hînî nivîsandin û xwendinê, hînî huner û duristkirinê kirine⁴.

5- Xwedawend Iya: Dibêjin ku aqilmendî ji ba wî ye, û parastina mirovan ji nexweşiyên jî ji karê wî ye. Ev xwedawend pispore sîhir û remildariyê ye. Ew "*Abzû*" (ava bin erdê) ya pîroz li perestgeha bajarê Erîdû yê somerî ji bo dêlîndêzên sîhrê, ji bo saxkirina û parastina ji nexweşiyên bi kar tîne. Bala xwe bidinê: Heya niha jî yên ku hicêb û nivîştan dinivîsînin ji nexweşan û yên ku sîhir li ser wan heye dixwazin ew hicêba ku wan bi boyê (ximav) nivîsandine têxin avê, û di pişt ra wê avê vexwin yan jî di laşê xwe bidin⁵.

6- Xwedawend Nînû: Ev wek "*Nînû*" û "*Mamî*" jî tê gotin. Giyanê wê û yê xwedawenda dayîk "*Cî*" yeke. Wê mirov afirandine, dema ku xwedawend "*Enkî*" hinek herf û çipil ji axa erdê teve xwîna goriyekî bi navê "genco" kiriye. Ev jî peyva kurdî "genc" (xortê ciwan) tîne bîra me. Dibêjin ku xwedawend "*Nînû*" 14 lib (perçe) ji herf û çipilê dan aliyekî. Xwedayê sîhir û remildariyê "*Iya*" pêle van perçeyên heriyê kir û di ber ra xwedawend "*Nînû*" dêlîndêz û navên pîroz dixwendin. Rabû 7 perçe ji wan dan aliyê rastê û 7 perçeyên din jî dan aliyê çepê, û wisa 14 mirov afirandin. Heft ji wan mêr û heftê din jî jin. Bi vî awayî heft cotên mirovan yên here pêşîn hatin afirandin. Bi zimanê somerî ji mirovan ra "*Lulu*" dihate gotin. Bi zimanê ibranî "*Adma*" gotine. Wisa tê xuyakirin ku ev peyv ji peyva "*Adamu*" ya mêzopotamî birine ku tê maneya "mîrovê erdê" (mîrovê zemînê)⁶.

7- Xwedawendên Anunnaki: Navê wan bi awayê "*Anunnaku*" jî hatiye. Dibe ku maneya navê wan "yên esmanî" be. Ji ber ku xwedawendê mezin "*Anû*" (xwedayê esman) ew afirandine. Ev xwedawendên payebilindin û asta wan di *Civata Xwedawendî* da asta here pêşîne. Ji van heft xwedawend bûn dadwerên "*Cîhana Jêr*" (*Jiyana Paşê*). Li gor gotûbêjên Somerîyan, Anunnakiyan pir afrînberên guhêrbar afirandine. Hinek ji wan gah û şêrên seriyê wan yê mirovane; hin jîndarên bi bask, meymûn û hin jîndarên ku seriyê wan yê mirovane û pêyên wan yên bizinane jî afirandine⁷.

8- Xwedawendên Agigi: Navê wan bi şêwazê "*Igigi*" jî hatiye. Dibe ku maneya navê wan "yên erdê" be û ji peyva "cî = erd" hatibe. Asta wan di *Civata Xwedawendên Somerî* da di bin asta Anunnakiyan ra bû. Para wan ew bû ku bi karên giran rabin, karên ku pir ked û renc jêra divêt; ew bi renc û cefayê ku didîtin razî bûn⁸.

9- Ziusudra: Ev qehremanê çîroka **Tofana Somerî** ye. Navê wî tê maneya "hemdem" (yê ku herdem zindî ye). Navê wî di çîroka *Tofanê* ya babilî da "*Utnapishtim*"-e (yanê dîsa yê hemdem). Di şêwazeka babilî din da bi navê "*Ethrahsis*" (yanê yê pir aqilmend) hatiye gotin. Ew bi xwe di kopya tewratî û îslamî da bi navê "*Nuh*" tê gotin. Ew di bingehê da bi awayê "*Nuweh*"-e⁹.

Heger me hesabê wê yekê kir ku di hin navên somerî da tîpa "s" di bingehê da tîpa "ş" ye, û yek ji wan peyva "Somer = Şomer"¹⁰; û hesabê wê yekê jî kir ku dengê tîpên "ş" û "ç" pir li nêziya hevîn, hîngê navê "*Ziu-su-dra*" dişibihe peyva kurdî "*Ziya-çû-dera*", yanê yê ku "*ziha* ji deryayê rizgar bû". Li gor efsaneyê "*Ziusudra*", ji ber pîroziya xwe û guhdarkirina xwedayan ew ji *Tofanê* rizgar bûye û xweda ew hemdem kiriye.

10- Galgamish: Ev navê raste û gotina "gal" ya somerî tê maneya "yê payebilind, yê pîroz" û peyva "ga" tê maneya "gah" yan jî "gamêş". Yanê maneya navê wî dibe "gayê bi hêz, gayê pîroz". Peyva "gal" di kurdî da bi şeweyê "kal" heye "yanê kesê mezin, kesê bi hurmet" û peyva "ga" jî her û her heya niha bi awayê "ga" yan jî "gah" tê gotin¹¹.

Galgamêsh bi xwe padîşahê bajarê "Ûrûk"e. Ew li dor salên 2900 b.z. jiyaye yan jî 2700 b.z. Ew bi qehremanê çiyayî "*Ankîdû*" ra ketiye pişkbaziyê. Bala xwe bidin şewazê kurdî "An kî da" (diyariya xweda Ankî). Tikesî ji van herdiyan nikarîbû zora yê din bibir , û wisa ew bûn du dostên hev mîna bira. Û dema "*Ankîdû*" dimire, dostê wî "*Galgamêş*" tirs û saweka giran ji mirinê hiltîne. Ew berê xwe dide çiyayên başûrê Kurdistanê û li "*Ziusudra*" digere, daku ji wî sir û nehîniya hemdemiyê nasbike. Li wir "*Ziusudra*" çîroka *Tofanê* jêra dibêje¹².

Evin xwedawend û kesayetiyên here navdar ku peywendiya wan bi çîroka *Tofana Somerî* ra heye. Niha tenha ma ku em bûyerên wê çîrokê pêşkêş bikin.

Çarşembe, 01.07.2015

Jêder

¹ Komek nivîskaran: Dîwana efsaneyan, rûpel 34. Seyed Muhemmed Al-Qimni, Çîroka afirandinê, rûpel 25.

² Seyed Mahmud Al-Qimni, Çîroka afirandinê, rûpel 26-27. Ebdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 143.

³ Samuel Kreimer: Ji tabloyên Somer, rûpel 98-99, 162, 163, 172, 180, 182. Ebdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 143. Komek nivîskaran: Dîwana efsaneyan, rûpel 32. Cemal Reşîd: xuyakirina Kurd di dîrokê da, 1/175. Sabatino Muscati: Şarstaniyên samiyan yê kevnar, rûpel 253, nîşe 21.

⁴ Geofry Barnder: Baweriyên ayînî li ba gelan, rûpel 36. Samuel Kreimer: Ji tabloyên Somer, rûpel 178. Ebdulhamid Zayed: Rojhilata Hemdem, rûpel 144.

⁵ Sabatino Muscati: Şarstaniyên samiyan yê kevnar, rûpel 254, nîşe 22.

⁶ Saaïd El-Ānîmî: Atra Hasis, rûpel 12, 17, 18. Gim Marrs: Serdari bi nehîniyê, rûpel 534. Dr. Seyed Mahmud Al-Qimni: Çîroka afirandinê, rûpel 26-27.

⁷ Samuel Kreimer: Ji tabloyên Somer, rûpel 61, 179-180. Komek nivîskaran: Dîwana efsaneyan, rûpel 37. Gim Marrs: Serdari bi nehîniyê, rûpel 525, 533.

⁸ Samuel Kreimer: Ji tabloyên Somer, rûpel 161, 179-180.

⁹ Saaïd El-Ānîmî: Atra Hasis, rûpel 19.

¹⁰ Georg Ro: Iraqa kevin, rûpel 119. Hasan Muhemmed Muhyedin Al-Saadi: Di dîroka Rojhilata Nêzîk ya kevin da, rûpel 50.

¹¹ Taha Baqir: Destana Gilgamêş, rûpel 54.

¹² Georg Ro: Iraqa kevin, rûpel 167, 171. Fadil Ebdulwahid Ali: Tofan di jêderên esmanî da, rûpel 17. Komek nivîskaran: Dîwana efsaneyan, rûpel 43.